

## **Agahî û zanyarî derbarê Sindoqa Cebirandina Ziyane ji bo gorî, xizm û kes û ziyandîtiyên kiryarên NSU'yê**

Civata Parêzgehî ya Tûrîngenê li 96emîn. Civîna xwe di roja 29ê Îlona sala 2017an ev pesendname derxistiye:

„I. Civata Parêzgehî diyar dike:

1. Koma têrorîst a veşartî ya sosyalîst a neteweyî ya rastgir (NSU) kuştiye

Enver Şîmşek

Evdilrehîm Ozûdogrû

Silêman Taşkoprû

Habîl Kilîç

Mihemed Tûrgût

Îsmâil Yaşar

Θεόδωρος Βουλγαρίδης (Têûdor Bolgarîdîs)

Mihemed Kûbaşîk

Halît Yozgat

Mîşîl Kîzûtêr

Bi zêdegavî û rastşopiya tund. Ji billî vê yekê, çend kes bi riya bombedanîne koma têrorîst a rastşop a NSU'yê li xwaringehêka Nûrênbêrgê li pişka başûrî ya bajêr li kolana Keupstraße û li Kolnê li kolana Probststeigasse birîndar bûn. Li êrîşên ku bi armanca dîzzîne pêk hatin, goriyên din bi giranî birîndar bûn.

2. Li gorî belgeyên ku ketine ber destê Komîteya Lêkolîne ya 5/1 a Civata parêzgehî ya Tûrîngenê, rayedarên ewlehiyê yê parêzgehê li pey kesên re-viyayî bi navê Uwe Bûnhart (Uwe Bönhardt), Uwe Mondlos (Uwe Mundlos) û Bêate Çêpê (Beate Zschäpe) ser neketin. Hevkariya navbera rêvebiriya berê ya parastina qanûna bîngêhîn li Tûrîngenê û rêvebiriya polîsê cezayî ya parêzgeha Tûrîngenê ji ber rikeberî û nebûna pêbaweriyeka dualî diyar nebû ku rê li ber pêkhatina lêkolînen serketî girt. Ji ber vê liv û tevgera neçê, bilez rê li ber çalakiya vê komê nehat girtinê, lê wan nekarîn kiryarên xwe di heyameka dirêj da bidomînin.

3. Civata parêzgehê berpirsiyariya xwe ya siyasî derheqê gorî, xizm û kes û ziyandîtiyên qetlan, êrîş û dizînên têrorîstî yên rastgirên NSU digire ser milê xwe.
- II. Civata parêzgehê ji dewleta Parêzgehê dixwaze ku,
1. sindoqeya cubrankirina zîyanê bona gorî, xizm û ziyandîtiyên ji ber kiryarên NSU'yê damezirîne û li vî warî da civatê agahdar bike û raporekê raber bike,
  2. Çarçovekê ji bo pêvajoyeka ne-borokratîk ji bo dayîna diravê zîyanê di demê da diyar bike.
- III. Civata parêzgehê Sindoqa Cebirandina Zîyanên Goriyan li çarçova rawêjkariyên têkildarî mûçeya dugane ya 2018/2019 dabîn dike."

Bernameya mûçeya parêzgehê li dewleta azad a Tûrîngenê ji bo Sindoqa Cebirandina Zîyanên Goriyan di sala 2018an da mûçeyek bi qasî 1,500,000,00 Eur berçav girtiye.

Şert û mercên çarçova hilêxistî li pesendnameyê ji bo pêvajoya şêwaza dayîna bedêla zîyanê, ji **Qanûn û rêzikên cihanînê ji bo Sindoqa cebirandina ziyana gorî û ziyandîtiyên kiryarên koma têrorîst a veşartî ya Sosyalîst a Neteweyî** hatiye wergirtin (Ji kerema xwe ji bo xwendina qanûnên cihanînê **Vê Derê** kilîk bike). Naverokaa pêwîst a van qanûnan li jêrê hatiye şirovekirin.

## **Çi kes dikare xizmetên Sindoqa Cebirandina Zîyanê werbigire?**

Qanûnên cihanînê derbarê babetên jêrê cuda û ciyawaz e

- Raberkirina xizmetan bo **xizmên** goriyên qetlê (hejmara 4),
- Raberkirina xizmetan bo **kesên ziyandîti** (hejmara 5) û
- Raberkirina xizmetan bo **rewşên dijwar** (hejmara 6) ji bo cebirandina ziyana tekîlî bo kesên ku ser esasa hejmara 4 û 5 xwedan mercê wergirtina xizmetan in.

### Raberkirina xizmetan bo xizm û kesên goriyên qetlê

**Kes û girêdayiyên yên ku hatine qetilkirin û navê wan li pesendnameya Civata parêzgehî ya Tûrîngenê hatine birin ji bo her babeta qetilê qasî 100,000,00 Euroyî pereyê werdigirin.** Ev dirav ji bo her babeta qetilkirinê bo xizmên xwedan mafê wergirtina xizmetan tê dayînê û – heta wê radeyê ku têkildarî çend kesan e – bi awayê dayînen cuda bo çend kesan tê veguhestin.

Hevjîn û zarokên kesê mirî pêka xizmên din xwedan mafê sereke jibo wergirtina xizmetan in. Di sere da hevjîn nîvê dirêv û zarokê nîvê din ji tevahiya dirêv werdigirin. Heke kesê mirî di dema mirinê da nezewicîbe, zarok an zarokên wî/ê diravê tam dê werbigirin. Dirav bi awayê beranber navbera çend zarokan da tê parvekirin. Heke kesê hatiye kuştin di dema cinayetê da nezewicîbe û tu zarokek ji wî/ê tunebe, dayîk û bavê wî/ê her du nîvê dirêv dê werbigirin.

Hûrgilliyên zêdetirê yên raberkirina xizmetan bo xizmên goriyên qetlê li xala 4 a rêzikên cihanîne hatine.

### Raberkirina xizmetan bo kesên ziyandîfî

**Kesên ziyandîfî** ji ber kiryarên din (li nkêleka qetlê) yên navbirî li pesendnameyê, li ser esasa asta ziyandîtinê bi qasî ji 20,000 Eur, 10,000 an 3,000 Euroyî werdigirin. Ev sûc pêkhatî ji bombedanîna li xwaringehê li Nûrênbêrgê li pişka başûrî ya bajêr, li kolana Keupstraße û li Kolnê li kolana Probsteigasseyê her wiha dizzînen ku koma veşartî ya Sosyalîsta Neteweyî pêk anîne ye.

Tenê kesek ku bi riya vî karî bi awayê rasterast tûşî ziyane bûye, dê ziyana wê were cebirandin. Wek mînak, kesê/a ku li cihê bûyerê nebûye û bi awayê nerasterast ji ber ziyana ku li kesek nêzikî wî ketiye an ziyana li malê wî ketiye, tûşî ziyane an dûhatên din bûye, tu xizmetekê ji Sindoqa Cebirandina Ziyane wernagire.

Hûrgilliyên mayî yên xizmeta bo kesên ziyandîfî li xala 5ê ya rêzikên cihanîne hatine.

### Xizmetên bo rewşên dijwar

Şiroveyên xizmetên din di **rewşa dijwar** da (hejmar 6 a rêzikên cihanînê) li nivîsa jêrê hatiye.

## **Ji bo wergirtina xizmetên Sindoqa Cebirandina Ziyane divê ez çi bikim?**

Raberkirina xizmetan bo xizmên goriyên qetlê û xizmeta bo ziyandîtiyan li ser daxwaza kesê/a ku xwedan mafê wergirtina xizmetan e, pêk tê. Daxwaz divê bi awayê nivîskî (wek mînak nivîsandî an bi E-Nameyê) were raberkirin. Her wiha dikare ji aliyê nûnerê kesek ku xwedan mafê wergirtina xizmetan e va were raberkirin.

Daxwaz divê **herî pirr heta roja... 2018an** raberî Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê (di dewama nivîsê: "Wezaretخانه") were kirin. Daxwazên wergirtî piştî vê heyamê êdî nikarin bî berçavgirtin. Heke pêkan be, Wezaretخانه divê heta 30ê Mijdara 2018an li ser daxwazên wergirtî di dema diyarkirî da biryarê bide.

Ji bo hêskirinê divê forma raberkirî li rûpela sereke ya Wezaretخانهyê were bikaranîn (Ji kerema xwe bona xwendina formê **vir** kilîk bike). Naveroka formê ji te ra dibêje ku çi agahî bona proseskirina daxwaza te pêwîst in. Bikaranîna vê formê neçarî nine. Helbet daxwazên din li formê nivîsê dê bî pejirandin.

Belgeyên piştgiriye ku agahiyên raberkirî li bernameyê piştrast dikin, divê pêveka daxwazê bin. Wek mînak belgeyên visa hene

- Belge û guwahiyên têkildarî zewacê û welatê sereke yê kesê daxwazker (Heke daxwaz ji bo xizmetan bo xizmên goriyên qetlê be) û
- guwahiyên pizîşkî bo ziyane lêketî (heke daxwaz bo xizmetên bona kesên ziyandîtî be).

Bi giştî kopya an versiyonek ji belgeyan ji bo isbatkirinê têrê dike. Heke derbarê belgeyên ku dixwazî raber bikî, piştrast ninê, dikarî digel kesên diyarkirî di lîsteya jêrê da bikevî têkiliyê.

Proseskirin û analîz divê heta radeya pêkan lezgîn û ne-borokratîk bin. Ev kar tê hêskirin, heke wezaretxane bikare gotin û agahiyên têkildarî daxwazan werbigire, da ku hilkolandina pêşmerca xizmetan sadetir û hêsantir bike (Wek mînak agahî ji rêvebiriya dadweriya fêdêral derbarê biryara bo dayîna xizmetên rewşa dijwar bo daxwazker).

Ji bo bidestxistina van gotin û agahiyên, lazim e ku kesê daxwazker razîbûna xwe digel berhevkerin, proseskirin û bikaranîna agahiyên xwe yê kesane ragihîne. Loma, forma daxwaza îmkana ragihandina razîbûnê dabîn dike. Kesê/a daxwazker dikare bi xwe biryarê bide ku gelo ji bo berhevkerin, proseskirin û bikaranîna agahiyên kesane razîbûna xwe ragihîne an na. Tu neçariyek ji bo kirina vî karî tune. Tevî vê yekê, heke razîbûn neyê ragihandin û di encamê da pêdiviyên pêşmerc ji bo raberkirina xizmetan nekarin bîn diyarkirin, ev yek dê li ser ustiyê kesê/a daxwazker be.

Hûrgiliyên pêvajoyê li hejmarên 5 û 7 ji rêzikên cihanîne hatine hilêxistin.

## **Xizmet ji bo rewşa dijwar**

Ji billî dayînen jorê bo xizm û kesên goriyên qetlê û kesên ziyandîtî, îmkana raberkirina xizmetan ji bo cebirandina ziyana tekmîlî ji bo **rewşa dijwar** heye. Ev wan babetan digire ber xwe ku dayînen jorê ji bo xizm û kes an kesên ziyandîtî ji ber rewşa taybet a dosyeyê têrê nake.

Xizmet ji bo rewşa dijwar ji riya Civata Parêzgehî ya Bêrlîne va (Civata Tomarbûyî) bo Civata Xêrxwaziyê ya Almanyayê. Bi navnîşana: Brandenburgische Straße 80, 10713 Berlin (Rêvebirê Cihanîne): Xanima Profesor. Barbara Can) tê raberkirin.

Mûçeya ber dest ji bo babetên rewşa dijwar demekê da tê diyarkirin ku wezaretxane derbarê tevahiya daxwazên têkildarî raberkirina xizmetan bo xizm û kes û kesên

ziyandîfî biryarê bide. Bi vî awayî çaverêfî heye ku raberkirina xizmetên rewşa dijwar beriya sala 2019an pêk neyê.

Tu dikarî agahiyên zêdetirê li ser vê mijarê ji riyaya Civata Parêzgehî ya Bêrlînê (Civata Tomarbûyî) ya ser bi Civata Xêrxwaziyê ya Almaniyayê ji xanima Profesor Barbara Can (pişka jêrê bibîne) werbigire.

## **Çi kes dikare agahiyan bide min an min li warê raberkirina daxwazê alîkarî bike?**

Wezaretxane bi şanazî agahiyên tekmîlîf dide te, li warê raberkirina daxwazê alîkariya te dike an bi rêbazeka guncan piştgiriya te dike. Ev rawêjkar li ber dest in:

Birêz Hayntêz (Heinz)

Têlêfon: 0361 573511246

E-Mail: [juergen.heinz@tmmjv.thueringen.de](mailto:juergen.heinz@tmmjv.thueringen.de)

Birêz Bodênbûrg

Têlêfon: 0361 573511275

E-Mail: [eberhard.bodenburg@tmmjv.thueringen.de](mailto:eberhard.bodenburg@tmmjv.thueringen.de)

### Navnîşana Posteyê

Wezaretê Koçberî, Dadwerî û Piştgiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê

Postfach 90 04 62

99107 Erfurt

Ji billî viya tu her demê dikarî serî li dadênera dewleta fêdêral ji bo gorî û xizm û kesên goriyan ên silûla Zwickau, xanima profesor. Barbara Can bidî. Ji vê riyê dikarî bi wê ra bikevî têkilliyê:

Profesor Barbara Can

Civata Parêzgehî ya Bêrlînê ya ser bi Civata Xêrxwaziyê ya Almaniyayê. (Civata to-marbûyî)

Brandenburgische Straße 80

10713 Berlin

Têlêfon: 030 86001182

0170 5641424

E-Mail: [john@paritaet-berlin.de](mailto:john@paritaet-berlin.de)